# Belavoka li ser lêvegerandina mesrefan li gorî madeyên qanûnî §§ 1877, 1878 ji destûra bingehîn ya Almaniyayê (BGB) ji bo serperiştên guhdanê yên xwebexş

Guhdan bi giştî bê beramber (xwebexş) tê birêvebirin. Lê mirov dikare wan mesrefên ku serperiştên guhdanê ji bo encamdana erkê xwe xerc kirine, li wan vegerîne. Ev tişt ji berpirsên qanûnî re (§ 1808 bendê 2 ji destûra bingehîn ya Almaniyayê (BGB) û her wiha ji serperiştên guhdanê re jî erbas dibe (§ 1813 ji destûra bingehîn ya Almaniyayê (BGB).

## 1. Bedelê mesrefê yê vebirî li gorî madeya qanûnî § 1878 ji destûra bingehîn ya Almaniyayê (BGB)

Bedelê mesrefê yê vebirî salane dike 425,00 €. Dema mirov van pere ji Dadgehê bixwaze pêdivî **nake** mirov belgeyan pêşkêş bike.

Ev vegerandina mesrefê salane ye, cara pêşî salekê piştî destnêşankirina serperiştê guhdanê tê vegerandin. Ev mafê isbatkirina bilindiya bedelê mesrefê yê vebirî dişewite, eger daxwaznameya fermî heta 30.06 ji sala di pey re nehate pêşkêşkirin. Ev **muhleteke dûrxistinê** ye, anku piştî derbasbûna vê muhletê êdî mirov nema dikare daxwaza vegerandina mesrefê bike.

Nimûne: Sala guhdanê li roja 15.08.2023 bi dawî tê. Divê mirov heta 30.06.2024 daxwaznameya xwe pêşkêş bike.

Eger gelek serperiştên guhdanê hatibin destnîşankirin, wê demê her yek ji wan kesên hatine destnîşankirin, dikare daxwaza vegerandina mesrefê bike. Serperiştên tengasiyê dikarin li gorî madeya qanûnî § 1878 bendê 2 ji destûra bingehîn ya Almaniyayê (BGB) tenê ji bo wê demê daxwaza bedelê mesrefê yê vebirî bikin, ew dema ku wan bi rastî tê de kar kiriye.

Eger tu ji me daxwaz bikî, em dê forma daxwaznameyê bidin te. Mirov dikare vê daxwaznameyê bê formeke fermî jî pêşkêş bike.

Eger mirov carekê bi fermî û bi aşkere daxwaza standina bedelê mesrefê yê vebirî kiribe, êdî di wan salên di pey re pêşkêşkirina raporta salane her car wek pêşkêşkirina daxwaznameyê tê qebûlkirin, lê helbet eger te **bi şêweyekî aşkere** dest ji daxwaza vegerandina mesrefê kiribe, êdî wê demê ew mesref li te nayê vegerandin.

Daxwazkirina vegerandina vê mesrefê ji Dadgehê tê wê wateyê, wek ku te ew daxwazî ji wî kesê/wê kesa elaqedar kiribe. Û li aliyê din jî, daxwazkirina vegerandina mesrefê ji kesê/kesa elaqedar tê wê wateyê, wek ku te ew daxwazî ji xezîna dewletê kiribe (§§ 1878 bendê 4 hevoka 3, 1877 bendê 4 ji destûra bingehîn ya Almaniyayê (BGB).

## 2. Bedelê mesrefê li gorî madeya qanûnî § 1878 ji destûra bingehîn ya Almaniyayê (BGB)

Eger ew mesrefên ku mirov xerc kirine ji 425,00 € bihtir bin, wê demê divê mirov wan mesrefan yek bi yek isbat bike (Roja serlêdanê, mesrefa çûnûhatinê, telefonên mirov encamdane, belgeyên polên postê li gel navûnîşana wan kesên mirov name ji wan re şandine

û hwd.). Dema mirov bi terembêla xwe her û were serê her kîlometrekê 0,42 € li mirov têne vegerandin.

Mafê mirov ji bo vegerandina wan mesrefên tekane dişewite, eger mirov wan di navbera 15 mehan de piştî çêbûna wan pêşkêşî kesê/kesa elaqedar yan Dadgehê neke.

## 3. Mafê hilbijartinê

Mirov dikare **yan** daxwaza bedelê mesrefê yê vebirî bike yan daxwaza bedelê mesrefê bike. Wî tiştî ji xwe re hilbijêre, ew yê ji bo te baştir be. Eger te carekê yek ji herduyan hilbijart, êdî tu salekê pê ve girîdayî dimînî û nema dikarî biguherî.

## 4. Proseya lêvegerandinê

a) Eger ew kesê/kesa elaqedar feqîr be, anku eger milk û malê wî/wê tune be, ku wekî bilindiya milk û malê parastî ye, wê demê eger mirov daxwaznameyeke fermî pêşkêş bike, êdî dê wan mesrefên hatine xerckirin ji xezîna dewletê bidin. Milk û malê parastî bi giştî 10.000,00 € ne.

b) Eger **milk û malê** kesê/kesa elaqedar hebe, êdî mirov dikare bedelê mesrefê (li xala 2 vegere), piştî mirov bi Dadgehê re axivî û bê pêwîstiya pêşkêşkirina daxwaznameyeke fermî, ji milk û malê kesê/kesa elaqedar rake. Û eger mirov bedelê mesrefê yê vebirî hilbijartbe (li xala 1 vegere), mirov dikare êdî wê mesrefê piştî bidawîbûna sala guhdanê ji milk û malê kesê/kesa elaqedar rake. Êdî kontrolkirin dê di çarçoveya pêşkêşkirina hisab û raport de bo Dadgehê were encamdan.